

**Mamoste Mihemed Nezîr Mustefa**  
**Sekreterê giştî yê Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyê (Alpartî)**  
**Çû ber dilovaniya Xwedê**

Roja Duşembê 22/12/2008an, li nexweşxaneke bajarê Şamê, dilê rêzdar û xebatkarê Kurd ê bi nav û deng (Mihemed Nezîr Mustefa) rawestiya. Roja Sêşembê



23/12/2008an, bi gurzên gulan, bi rondikên ser dêman û hêviyên mezin û giran, li Qamişlo, termê wî hate pêşwazîkirin. Bi hezaran welatparêzên Kurd, Ereb û Asûrî, partî û rêxistinên kurdî li Sûriyê, Rêxistina Asûrî ya demokrat, rêxistinên mafê mirovan û komîtên civaka sivîl digel nivîskar, helbestvan û rewşenbîrên Kurd û Ereb û gelek kesayetiyên xweser... Hemî bi hev re, li pey cendekê mamoste bi rêve çûn ta ew di goristana Qidûr Begê de, li bajarê Qamişlo bi cih kirin.

Rêzdar M. Nezîr Mustefa, di malbateke Kurdhez û welatparêz de xwedî bûye, bi mîrxasî, zanistî û hişmendî wî berevanî di ber doza gelê Kurd a dadmend û rewa de kiriye, li hember pîlan û pirojeyên şoven digel hevalên xwe serî hilda ye, daxwaza mafên gelê Kurd kiriye. Lê, wan şoven, zikreş û hiştengan ew bi 8 salan ceza kirin û wî ew sal ji temenê xwe di zindanê de bûrandin.

Gelek gotin û birûsk di rê û resma veşartina termê Mamoste Mihemed Nezîr de hatin xwendin, û li ser qencî, comerdî, zanebûn û mîrxasiya wî bi dirêjî hate xwendin.

Bila serê heval, malbat û merivên wî û serê gelê me bi tevayî sax be û cihê wî buhuşta rengîn be.

Bi boneya koçbarkirina mamoste M. N. Mistefa, rêxistina partiya me li Ewropa

behîname ji serkirdayetiya al-partî re rêkiribû. Emê wê behîname biweşînin.

**Yekîtî - Rêxistina Ewropa ya 28.12.2008**

**Behîname**

Hevalên hêja, serkirdayetî û endamên Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyê (al-Partî)

Xwîşk û birayên hêja, malbata mamoste Nezîr Mistefa

Me bi dilekî xemgîn û şikestî nûçeya koçbarkirina dawiyê ya xebatkarê hêja mamoste Mihemed Nezîr Mistefa (rehma Xwadê lê) bihîst. Helbet koçbarkirina xebatkarekî weha, ku piraniya jiyana xwe bona gelê xwe yê Kurd û doza wî ya rewa û dadmend terxan kiri bû, ziyaneke mezin û giran e. Ne tenê ji partiya wî re, belê ji tevaya Tevgera Kurd li Sûriyê re. Çûnkî ne hertim û ne jî li her cihê ew xebatkar peyda dibin, yê ku yekîtiya tevgera xwe û berjewendiya gelê xwe di ser her tiştekî din re digrin. Lewre jî em vê koçbarkirina dawiyê ya mamoste Mihemed Nezîr Mistefa weke jidestdaneke mezin dibînin. Lê yê ku hinekî dilê mera rehet dike ew e ku dawiya jiyane ji xebtkarên weke mamoste Nezîr re destpêka jiyaneke nû ye. Mamoste Nezîr ne mirî ye, ew di wijdana gelê xwe de zindî ye, ew tev i karwana nemiran bûye. Xwedîderketina keç û lawên Kurd çi li welêt, çi jî li derveyê welêt – li rehmetî vê rastiyê diçespîne

**-Xwîşk û birayên hêja,**

di heman dema ku em ji gelê xwe re, ji Partiya Demokrat

**D.R.(5)**